
IFMETALL

# 7 sedemên baş ji bo tevlîbûna IF Metall'ê



# Bê guman divê hûn tevlî bibin!

Ma hûn meraq dikin ku hûn çima beşdarî sendîkayê bibin? Ma hêjayî wan sed banknotan e? Bersiv Herê ye - hûn bi her tiştê ku kollektivavtalet  (peymana kolektîfî) û endametiyê dide we pir zêde li we vedigere. Gava ku gelek ji me yekgirtî bin, hingê em dikarin ew maf û berjewendîyên ku wekî din ji dest me diçin, bernedin, tiştên ku em pir caran pir hêsan hesêb dikin. Gelek sedem hene ku hûn beşdarî IF Metall'ê bibin. Li vir hinek ji yên herî girîng hene:




## A-kassa û sîgortaya/ temînata hatinê

Heger hûn karê xwe winda bikin, hûn dikarin ji A-kassayê (temînata bêkariyê) tezmînatê bistînin. Di gel vê yekê, sîgorteya dahatê ya pêvekî jî li nav vê endamtiyê ye. Li vir hûn dikarin hesab bikin ka sîgorta dê ji bo we bê çi wateyê .

# Şert û mercên xweş û mûçeyeke baş




Bi saya peymanên me yên kolektîfî, di nav tiştên din de, hûn meaşeke baş û dadperwer, zêdebûna mûçeyên birêkûpêkî, demjimêrên kar ên maqûl, tazmînata zêde, mûçeya nexweşiyê û kêmkirina demjimêrên xebatê werdigirin. Dema ku we karê xwe qedand, hûn dikarin ji avtalspensionen'ê (teqawidiya peymanî) ya bêhtir sûd werbigirin.




# Ciyê xebatê ya bi ewle

Ciyeke baş a xebatê ji bo pêşîgirtina li qeza û nexweşiyan girîng e. Em piştrast dikin ku kardêr li gorî Arbetsmiljölagen (Qanûna Jîngeha Kar) tevdigere û skyddsombud (nûnerên ewlehiyê) hene ku ji bo ewlehî û xweşiya we dixebitin.

# Dema pêwîst be alîkarî û piştgirî




Em şîret û piştgiriyê didine we li dema bûyera jikaravêtinê, rehabîlîtasyonê, danûstandina derbareyê mûçe û hêj bêhtir. Heger hewce be, hûn dikarin alîkariya huqûqî jî werbigirin. Em di heman demê de dixebitin da ku hûn bikaribin di rola xwe ya pîşeyî de mezin bibin, da ku hûn bibin xwediyê jêhatîbûnên ku dê di pêşerojê de jî li rewacê bin.




# Temînata hem li ser kar û hem jî li dema vala

Hûn dikarin bi rêya peymanên me yên kolektîfî û sîgortayên endaman tezmînatê ji bo qezayên li ser kar biqewimin û qezayên li dema we ya vala biqewimin, her wisa jî gava hûn nexweş bin, bistînin. Dema hün di îzna dêbavtiyê de bin, hün pereyên ekstra jî distînin.




# Bandora li ciyê kar

Di gelek mijarên girîng de, berî ku biryar werin girtin, divê kardêr bi me re li IF Metall'ê li cîhê kar muzakere bike. Bo nimûne, ew dikare derbareyê guhertinên saetên kar û erkên kar be, yan jî derbareyê pêşxistina mûçe li cîhê kar be.. Wekî endam, hûn dikarin li ser vê yekê bandora xwe bikin.




# Bi hev re em bi hêz in

Bi tena serê xwe kirina daxwaza mafê xwe zehmet e. Lê hûn ne bi tenê ne. Em 300.000 endam in. Em bi hev re dikarin şert û mercên hemî karkerên sinaiyê baştir bikin û edaletê di civakê de zêde bikin.


# Modela Swêdê

Ji dawiya sedsala 19"an û vir ve ye ku sendîkayên Swêdê ji bo karker bibin xwedî mûçeyeke baş a û şert û mercên xebatê yên minasib têdikoşin. Li gorî gelek welatên din, sendîkayên swêdî xwedî bandoreke mezin in, bi saya wê yekê ku em bi gelek endaman re baş organîze bûne. Ew me bi hêz dike - ew qas bi hêz ku siyasetmedar ne hewce ne ku pir mudaxeleyî şert û mercên xebata me bikin.

Em bi piranî û her tiştî - ji saeta kar û mûçeyan bigire heya teqawîdan û temînatan - bi kardêran re danûstandinan dikin. Kollektivavtalet (peymana kolektîf) ev e.

Siyasetmedar li şûna wê dikarin li ser pergalên me yên refahê û hewcedariya me ya perwerdehiyê, ango ew bingeha ku xebatkarên ewledar û jêhatî dafirîîne, bisekinin. Ev bi gelemperî ji re Modela Swêdî tê gotin.

Ev model dixwaze ku gelek ji me bibin endamên Sendîka'yê. Dema ku em bi rêkûpêkî rêxistî bin û gelek kes li pişt daxwazên me bin, em dikarin bibin dengek bihêz û peymanên kolektîf ên bihêz bi şert û mercên hêja û mûçeyên baş bi dest bixin.



## Mesrefa wê çi ye?

Xerca endametiyê bi hatina we ve girêdayî ye. Bi navincî, xercê IF Metall’ê ji sedî 1,55ê dahatê ye. Ji bo heqê endametiyê  heger tu karê xwe winda bikî tu A-kassa û sîgorteya dahatê distînî her weha hemî tiştên din ên bingehîn ên ku di vê broşûrê de hatine rêzkirin.


## Bi vî rengî hûn beşdarî IF Metall’ê dibin




Mirov bi hêsanî dikjare bibe endamê IF Metall’ê.

Heger we BankID hebe, hûn dikarin bi xwe ji bo endametiyê serî bidin li: ifmetall.se .

Heger hûn di serlêdanê de hewceyê alîkariyê bin, bi nûnerê sendîkayê re li cîhê karê xwe biaxivin an bi beşa xwe ya herêmî ya IF Metall’ê re têkilî daynin.



IFMETALL

IF Metall / 2025-10 / OF-170-KU